DUWALÎZMA YEKBÛN – PERÇEBÛN
Û TIRS JI PERÇEBÛNA PERÇEYÎ

Pêşkêşe ji bo: BEXTIYAR ELI Û MERIWAN WIRYA

Evdal Nurî Evdal – DUHOK

Tewerên Vê Nivîsandinê:-

1- Hewla pênasekirina yekbûn û perçebûnê.
2- Fakterên rêxweşker ji yekbûn û perçebûnê ra.
3- Rê û jêderên li darxistina yekbûn û perçebûnê.
4- Dîyalîktîk û dangehên pêvajoya yekbûn û perçebûnê.
5- Kurd û duwalîzma yekbûn û perçebûnê di nav dîrokê da.
6- Sinorên dewleta neteweyî û verêja wê li ser rewşa yekbûn û perçebûnê.
7- Riyalta Kurdî ya evro û duwalîzma yekbûn – perçebûn,perçeya başurê Kurdistanê wek mînak.

.....

HEWLA PÊNASEKIRINA YEKBÛN Û PERÇEBÛNÊ

Yekbûn, curekê rêkxistinê ye, li ser hinek binemayan tê avakirin, mîna: wekyekîyê û jêyatîya hevpişk... Wezîfe ya wê pêgehiştina hizrê ye di dîrokê da (ruha reha li pey lojîkê HEGEL[1]) li vedîtina tiştê berze û jîyandina tiştê neyî û bersivdana pirsên sergerdan yên mirovatîyê.
Yekbûn di gel perçebûnê da, duwalîzmekê pêktîne û halê wê bi halê her duwalîzmek din, li gel hev dijîn û bêyî hev jî nabin. Lê yekbûn

1. "HEGEL" bi felsefa xwe ya Aydîalîzmê ve u bi têgehê xwe yê (ruha reha-ABSOLUTE SPIRIT), wênedariyên (tesewrat) seyr û sernçrakîş derbarey hijmareka têgehên me'rîfî ve heye, nemaze hizir û dewlet û maf û dîrukê. Bu mînak: dewlet di nerîna "HEGEL"bûnewerekê xwedî huş û lujîke û wezîfeya wê serkeftina yekbûnê li dij perçebûnê ye û ya hizrê li dij madde ye. (Nizîh Nisîf Alaywbî) di kitêba (Al'reb we mişklet aldewle).

nûnerîya alîyê başîyê " Ahuramezda" dike, bi lêgerîyanê li tiştê nû û bi hevrajîyanê û bi bizava ber bi pêş. Berevajî perçebûnê ku nûnerîya alîyê xirabîyê "Ehrîmenî" dike, bi hev veqetandina tiştan û ajotina wana ber bi mirin û zewalê ve.
Dema yekbûn li ser perçebûnê da zal dibe, hêzê berhem dide û maşîna dîrokê ber bi pêşve dibe û şaristanîya mirovatîyê avî û ava dibe. Ji "term" û" kunsîpt" yên heval û hevçeber di gelda: rêkxistin, hebûn, nûbûn, xwebûn, karlêkirin û gehandin û . ... Berevajîya wê li dema perçebûn li ser yekbûnê zal dibe, lawazî peyda dibe û dîrok tê dabran û jîyan di cemde û têrm û kunsîpt yên heval ji perçebûnê ra: enarşîzm, nebûn, kevnarî ,mişexurî "dûvelank", dabran û lihev negehştin.[2]

FAKTERÊN RÊXUŞKER JI YEKBÛN Û PERÇEBÛNÊ RA

ji fakterên rêxuşker ji yekbûnê ra: wekyekî û jêyatîîyên hevpişik û hewcedarî. Lewma yekbûn li ser wana kar dike û kakilka xwe ji wana pêktîne, lê ev nayê wê watayê ku yekbûn serederîyê di gel cudahîyan jî nake, belku wana jî bi xweve hembêz dike u cihekê di nava laşê xwe da ji bu wan cudahîyan jî li pey pirnsîbê " pejrandna yêdin yan yê cuda" terxan dike u ji fakterên rêxuşker ji perçebûnê ra tenha cudahî ne. Lewma perçebûn li ser dirustkirin û peydakirina cudahîyan kar dike bi rêya çandina tovê dûberekîyê di nava wekyekan da ,û ev kare jî pêtir li ser derûnê mirovên nesax tê peyrewkirin, evcar dema yên wekyek û yên jêyatî ji bu heman jêder heyî ji hev perçe dibin li wî demî pêwîstîya yekbûnê ji her demek din pêtir berçav dibe.

RÊ Û JÊDERÊN LI DARXISTINA YEKBÛN Û PERÇEBÛNÊ

Yekbûn

Çendîn rê û jêder ji bu li darxistina yekbûnê hene, ji wana:

---

2. Bila ji bîr neçe ku perçebûn di cîhana zanistê BIOLOGY her weha CHEMISTRY u PHYSICS yê jî da, afranderê jîanê ye, her wek perçebûna gerdûnî yan ya şaneyan. Lê me di vê nivîsana xwe da ji kujiyê ANTHROPOLOGY û civakî behsa perçebûnê kirye.

1. Rê û jêderê hêz û zordarîyê. Ji tiyorzanên vê rêyê "ROBERT CARNEIRO " + MACCHIAVELLI ".
2. Kumcvînên rezamendîyê û temamkarîyê PLATO+ARISTOTLE " û rêya "hevbesta civakî "MONTESQUIEU " + JOHN LOCKE + ROUSSEAU + THOMAS HOBBES"
3. Rê û jêderê hizrê " aydulujîya " çi ev hizre ya dînî be" Mihemed û Îslam" çi ev hizre ya felsefî be "MARXISM " çi jî hizreka aydîyal be (IDEA IN IT SELF) " HEGEL"
4. Jêderê hebûna qebxwastinan û bersivdana wanan "ARNOLD TOYNBEE" .
5. Rêya hebûna rulê takekesî di dîrokê da, mîna superman û qehreman û qurtalkeran."NIETZSCHE", "HERBERT", "SPENCER", "PLEKHANOV".
6. Rêya nijandna senterên bazar - bajar " matrîyalîzma dîyalîktîkî".

Perçebûn

Ji rê û jêderên belavebûna perçebûnê:
1. Nebûna qebxwastnan.
2. Nebûna şîyanên nûjenkrnê û nûbûneveyê.
3. Razîbûn bi bersvên hazir û çarçuve û bazineyên datraşî.
4. Zalbûna royê tamakarî û şehwet u pareyî di ser û derûnê seruk û deshelatdaran da.

Dîyalîktîk û dangehên pêvajoya duwalîzma yekbûn – perçebûn

Hevbendîyeka dîyalîktîkî di nêvbera her dû serên duwalîzmê da heye u di hindir pêvajoya wê ya dîrokî da, pirusêsên "perçebûna yekbûnê "û" yekbûna perçeyan" tên li darxistin. "cabrî "vê pêvajoyê bi vî awayî desnîşan dike:- yekbûn - perçebûn - yekbûneka mezintir û berfirehtir û bi hêztir[3]. Eger çi em jî di gel vê hevkêşê da pêktên, lê paşî destkaryeka lastîkî di nêvda ku me ji hev rakêşaye der û bi vî awayî:-

Li destpêkê yekbûn ya hey û di nava rehim û hinavên her yekbûnekê da perçebûn - ya ku çaverwanîya baruduxekê

3 . Mihemed a'bd alcabrî, "alturat we alhedase" lapera (39)

guncaw ji bu peydabûnê dike - heye , evcar dema ji rehima yekbûnê perçebûn peyda dibe çendîn perçe jê di peşin û her perçeyek bi xwe di xweda yekbûneka xwesere ku ew jî qabile ji bu perçebûneka biçûktir û lawaztir. Di gel werar û pêvajoya civakên mirovatîyê - huş di dîrokê da - bere bere pirusêsa yekbûnê li ser perçeyên biçûk - perçeyên perçeyan - kar dike , ku di encamda yekbûna parçeyên biçûk ava dibin û êdî ji çendîn van yekbûnan yekbûneka mezintir û berfirehtir û bi hêztir ava dibe.

Ji bu pêtir zelalkirinê em di karin dangehên pêvajoya yekbûn - perçebûn di hindir dîrokê da, weha destnîşan bikin:-

- Dangehê yekem : hebûna yekbûna xwezayî / destpêkî.
- Dangehê duwem: perçebûna xwezayî (= yekbûnên perçekrî yan perçeyên yekbûyî.
- Dangehê sêyem: perçebûna perçeyan = perçebûna yekbûnên perçekirî yan perçekirina perçeyên yekbûyî.
- Dangehê çuwarem: yekbûna perçeyên perçeyê
- Dangehê pêncem: yekbûna yekbûnan/ yekbûna mezin

KURD Û DUWALÎZMA YEKBÛN - PERÇEBÛN DI HINDIR DÎROKÊ DA.

Ev duwalîzme, yek ji wan duwalîzmane ya ku berhevyeka hemîşeyî di dîroka gelê Kurd da heyî: her ji royê pêkhateyê civakî ve, ku di pirt û belavebûna bi sedehan êl u hozên Kurd li ser her bihusteka KurdIstanê xweya dibin, evcar ji royê pêkhateyê sîyasî ve bi perçekirna nexşê hêzê li ser pêtir ji cihek û senterekê birîyarê, heya ji royê pîkhateyê hizrî û rewşenbîrî ve ku di hebûna hemerengîya dîyalêktan û nebûna rênivîseka yekbûyî berçav dibe.

Diyare, terazoya hevkêşa yekbûn - perçebûn, ne ya hevsenge, belku seng pêtir di alîyê perçebûnê da kişaye û ev alîsengîye yeke ji hukarên bingehîn li pişt dabiran û veqetîyana Kurd di dîrokê da u yeke ji hukarên nebûna dewleta Kurdî herweha ji encamên nebûna dewleta Kurdî jî. Ji ber ku perçebûn nîşan û jêderê lawazîyê ye u yê lawaz jî nabe mijar û çîruk ji dîrokê ra. Kanê çewa vê hevkêşê karîgerî li ser dîroka me hebuwe, weha jî li ser evro ya me û paşeruja me jî heye. Lew pêdvî bi tiyorîzekrnê - belku bi kunfiransên ekadîmîk - heye.

Yekbûn û Kurd di hindir dîrokê da û heya niha li hevnehatîne, eger çi xewna hemîşe ya her takekê Kurd buwe. Hewlên li darxistina wê ji alîyê tiyorî ve hatine dayîn mîna:"şerefxanê Bedlîsî" (em hemû bereyek bûn) û "Ehmedê Xanî" (ger di hebwa me itfaqek). Her weha ji alîyê piraktîkî ve jî hinek hewlên cidî hebûne, mîna: hewla " Mela Idrîsê Bedlîsî " ji bu kumcivîn û serhevhatina mîrên Kurd[4], serjinûve damezirandina mîrgehên Kurdî[5], "'Ûbêdilla Nehrî " û hewla wî ya bestina kungreyê neteweyî[6], "Bedrxan Paşa" û xema wî ne tenha jibo yekbûna Kurdî belku ji bu yekbûna Ermen û Kildan û neteweyên din jî di gel Kurd da[7], "Mîrê Kure" bi rêya darê hêz û zordarîyê[8], kar û bernameyê çendîn partîyên sîyasî yên Kurdî û . . Welê çi ji wan hewlan sernegirtin û berhem nedan.

Li hember Kurd û hewlên yekbûnê, di bînîn, hewlên yêndin "gelên dewr û ber"[9] li gel yekbûnê li hevhatin û bûne cut û gavên piştrast û berfireh ber bi şarstanîyê ve avêtn, çinku - her wek me li destpêkê daye xweyakirin - yekbûn jêderê hêzê ye û hêz yarîkerê/ lîstikvanê yekane yê dîrokê ye. Yê nikarî yekbûnê berhem bide - mîna Kurd - ji dîrokê dabraye û veqetîyaye û beşdaryeka berçav jî di avakirna şarstanîya mirovatîyê da ne

---

4 . Rêkeftina "Mele Idrîsê Bedlîsî" li gel "Sultan Selîmê yekem" ew bu, Kurd piştevaniya Osmanîya di şerê wan li gel imbraturîya "Sefewî" da bikin, li hember dana otunumîyê ji aliyê Sultanî ve ji bu Kurdan, lê paşî ku "Osmanî" bi alîkarîya Kurdan serketîn, sozên xwe yên bi Kurdan ra bi cih ne anîn u paşan her li ser binyatê wan sinuran di rêkeftina "Zehaw"ya sala(1639) da û pi pirutukuleka nêvdewletî 'erdê Kurdistanê di nêvbera herduwan da tê dabeşkirin.

5 . Her ji sedsalîya (15 - 19) hinek dever ji Kurdistanê nemaze deverên çîyayî ji dervey desteserî û deshelatîya imbraturyên wî serdemî ve diman û bi awayê mîrgehên serbexwe û nîmçe serbexwe jiyan dikrin.

6 . Navbirî li sala (1880) li devera xwe ya "şemdînan" kunfiransek bi beşdariya nêzî (220) kesatiyên Kurd ji Mîr û şêx û seruk êl û derebegan best bi armanca li darxstina yekbûna Kurd û daxwaza Kurdistaneka serbexwe.

7 . Bedrxan Paşa" gavên piraktîkî ji bu yekbûna Kurdan avêtn û şiya tagîrî û piştevanîya mîrên her dû mîrgehên "Hekar" û "Muks" bi awayekê rezamendî bi destve bîne.

8 .Mîrê Kure" hewla yekbûna Kurdan bi darê hêz û zordariyê da, devera "Badînan" bi temamî desteser kir û gav ber bi mîrgeha "Butan" ji aliyekî û ber bi mîrgeha "Baban" ji aliyek din ve avêtin.

9 . Gelên dewr û ber ku mebest pê " Turk û Fars û 'Ereb" zu bi zu di gel yekbûnê li hevhatin û bûne xwedî hêz. Wek yekbûna Farsan di hindir dîrukê da " Exmînî, Furtî, Sasanî û heya Sefewî û Qaçarî". u ya "Turkan" bu nimûne "al Osman" û ya 'Ereban " "Qureyşî" u paşî bi nave " Îslamê".

buwe, lê yê yekbûn berhemday, buwe xwedî hêz û tevaya erkên xwe bi cih anîne.
Pir pêwîste li jêr sînahîya (dangehên pêvajoya yekbûn - perçebûn) têhzrîn û xwendneka hûr û kûr ji bu rîyalta Kurdî ya duhî û evro bê kirin, ji bu em bizanibin duhî em li kîjan dangeh bûn û niha em li kîjanin?.
Ya ku girêdayî duhî, niha em bas bikin, lê ya girêdayî evroya me, em bu geha dawiyê ji vê nivîsana me bi hêlîn.
Bi bawerîya min, li destpêkê, anku li dangeha yekem ya jîyara Kurd, yekbûna xwezayî hebu, li dema hêj reh û tîrên êl û hoz û 'eşîrên Kurd ew qas ji hev nehatbune der. Her wek berî niha me li ser zardevê "şerefxan Bedlîsî" anîye zimên(em tevda bereyek bûn). Paşan hal bi halê her yekbûnekê ya ku perçebûna xwezayî jê di peşe "dangeha duwem" destpêdike. Paşan ev perçebûna xwezayî û li jêr karîgerîya çendîn fakterên sosyolojî, sîyasî, aburî, rewşenbîrî/dînî û qanunî . Dibe rîyalt û ber bi dangeha sêyem ve/perçebûna perçeyan diçe.
Bi darştinek din: li destpêka xweyabûna gelê Kurd li ser depê dîrokê, pêyekê wan li dangeha duwem bu û pê yê din li dangeha sêyem da bu û hewlên derbazbûnê jî ber bi dangeha çwarem ve di avêtn, her wek damezrandina mîrgehên Kurdî li çaxên naverast, lê berdewamî bi xwe ne da û paşvegerîyane cihê xwe yê caran û perçebûn li serda zal bu heya sedsalîya (15 - 16) ku serjinûve hinek mîrgehên din yên Kurdî şînbûneve û li wî demî şerê "Çaldêran" rû dide û hewleka din ya yekbûna perçeyên biçuk li ser destê "Mela Îdrîsê Bedlîsî" li kar dibe, lê ji ber ku ev gave ne ya xweser bu, belku paşgir û dûvelankîya Sultanê Osmanî "Selîmê yekem" bu , lewma ev hewle jî bernegrt[10]. Di bêjin: Kurdistan ji bu yekem car li şerê "Çaldêran" buwe dû perçe! raman jê ewe, em li pêşî şerê navbrî yek perçebûn û ev jî ne raste, belku bi dîdevanîya "şerefxan Bedlîsî" em Kurd li wî serdemî nêzî (40) mîrgehan bûn, anku cografîya Kurdistanê li wî serdemî li ser pêtr Çil perçeyan (Çil senterên hêzê) ya perçekrî bu û li pey zimanê zaravên vê nivîsana me, em li dangeha sêyem da bûn/ perçebûna perçeyan. Li gel burîna demî, çendîn hewlên din ji bu derbazbûnê ber bi dangeha çwarem ve di hêne li darxistin, lê ne bi hêza hewla yekem (damezrandina mîrgehên

10 . Ji ber ku yek ji sîma û mercên yekbûnê her wek me li destpêka nivîsîna xwe da amaje pêday, gereke ya serbexu be, nek dûvelank be.

çaxên naverast) û ne jî bi hêza hewla duwem (Îdrîsê Bedlîsî û yekbûna perçeyan/ mîrgehan). Lewma wan hewlan jî serkeftin bi destve ne anî û hêz û vejen neda maşîna dîroka Kurdî ku derbazî qunaxa çwarem bibe[11], ew qunax ya ku bi rast û dirustî bibu - û heya niha jî - xewn û hîvîya her takekê Kurd. Ev destudare mave heya werçerxaneka nû di deverê da rûday, ew jî nexşekêşana hêl û sinurên dewleta neteweyî (STATE NATION) li destpêka çerxê (20) ku em di bêjin êdî Kurdistan bu Çiwar perçe.

SINORÊN DEWLETA NETEWEYÎ Û VERÊJA WÊ LI SER REWŞA YEKBÛN Û PERÇEBÛNÊ

Li çarêka yekem ji sedsalîya (20) nexşeyê sinurên dewletên neteweyî li devera rujhelata navîn û li pey rêkeftina "SYKES-PICOT" binech di bin û bu yekem car Kurdistan ji royê qanunî - cografî ve di nav Çiwar ji wan dewletan da tê perçekirin.
Ev dîmenê sîyasî yê nû li deverê pir pêşhate afrandin. Di encamda hijmareka guhrankarîyan bi ser rewşa duwalîzma yekbûn - perçebûn da hatin, li serekî: perçebûna yekbûnan hat li darxstin, ew jî bi zalbûna perçeyê li ser yekbûnê bi rêya ji hevcudakirina wekyekan mîna ji hevcudakirna Kurdan û her weha ji hevcudakirna 'Ereban jî. Li serê din: yekbûna perçeyan hat li darxstin, ew jî bi zalbûna yekbûnê li ser perçeyan, bi rêya yekbûna hemereng û cudahîyan, mîna yekbûna çendîn netewe û ol û mesebên hemereng di qewarê/çarçuveyê yek dewlet da, anku vedîtina jêyatyek/ nasnameyek nû ji bu tevaya van reng û cudahîyan ku nasnameya wê dewletê ye ya ku ketîne di bazineyê wê da.
Di gel van guhrankarîyên dûserî da, dîrok arasteyeka nû, her weha rol û erkên nû bi xweve di bîne ew jî: rastvekirina rewşa duwalîzma yekbûn - perçebûn ê, di hinidr encamdana dû pirusêsan da û bi vî awayî:
1) Helweşandna yekbûnên li ser binemayê hemerengiyê û cudahîyê hatîne avakirin, ku piranîya wan bi darê hêz û zordarîyê

11 . Perçebûn û cudabûnên seyr û semer di dîruka Kurdî da hene, û bêhn û tama xayintiyê jê difre wek helweşandina piranîya mîrgehên Kurdî nemaze ya "Erdelan" û "Butan" u "Suran" û "Baban" û pir sedem jî li pişt vê perçebûnê hebûne. Ji bu pêtir zanîariyan vegerê mijara (sîyaset feriq tisud altî atb'tha alambraturiye al'osmanîye we alsefewîye ticah alkurd) evdal nurî , micele gulan al'rebî , al'ded (18) 1997.

û bêy rezamendî - rawergirtina girupên cuda yên pêkhênerên yekbûnê - hatîne avakirin. Êdî bi bawerîya min çarenivîsê tevaya van yekbûnan helweşandine u kanê çewa impraturîyên caran û "Yekbûna Suvêt" ya berê hatine helweşandin weha jî heman çarenvîs çaverîyê dewleta : 'Îraq û Turkîya û Surîya û Îranê jî dike.

2) Serhevhatina perçeyên wekyek yên ku li ser binemayê hêz û zordarîyê ji hev cudabûn û veqetîyan, mîna neteweya 'Ereb û neteweya Kurd û Ermen û . .

Ev bizava hewlên li darxistinê di hindir dûbarekirna heman kêşeyên serdemê danana sinurên dewleta neteweyî û evro ya me bi başî xweya dibin. Bu nimûne : mijara raprsîna gelê Kurd li başurê Kurdistanê kanê digel dewleta 'Îraqî da bi mînin yan ne. Hebûna heman sengên hêzê li başurê Kurdistanê. Mijara mafên Kurd li Turkîya ku ji aliyekî ve serjinû behsa vegerîyanê bu desturê bingehîn yê Turkîya û şerîkîya Kurd û Turk di welat da tê kirin û ji alîyê dinve behsa bi destveanîna mafên Kurd li pey hevpeymana "Sîver" di rojevê da ye.

Dûbarekrna heman kêşe û heman mijar li paşî maweyî Sê çarêkên çerxî, ramana benckirna ruha dîrokê, anku pençerkirna xirxala dîrokî dide[12] ku di hinidr ew maweyê dîyarkrî da dîrok ber bi pêş ne çuye u nikariye rastvekirneka berçav di rewşa duwalîzmê da bike û herdû pirusêsên xwe jî encam bide û helbet vê yekê jî girft û astengên xwe hebûne ku em dikarin weha rêz bikin:-

1- Pîrozîya sinuran û parêzerîya qanuna nêvdewletî jêra, ku di encamda duwalîzmeka qanunî - sîyasî ya nû peyda dibe, li aliyekî: serwerîya dewletan û parastna sinuran û li aliyê din: mafê çarenvîs yê gelên jêrdest. Mehzela herî mezin derbarey pîrozîya sinuran helwîstê neteweya 'Erebe ya ku li aliyekî hebûna sinuran bi karekê kulunîyalîzmê bi nav diben û ret diken û li alîyê din sinuran ne tenha di parêzin belku di perêsin jî.

2- Ne berhevî û nebûna dîmukrasiyê, anku ne berçavwergirtina vîna gelan li hember vîn û piragmatîzma desthelatdaran.

---

12. Piranya ev kêşeyên sîyasî yên niha heyî ji daykbuyin yên serdemê nexşekêşana sinurên dewleta neteweyine, belku dûbarekrna wane, her dê bêjî ku dîruk di hindir maweyê nêzî (70) salan hatbû benckirin yan di xewbirin.

3- Maytêkirna dewletên zilhêz di deverê da û bi karanîna sîyaseta cut sitandard[13] (alahtwaء almzduc)
4- Nebûna rolê takekesan/qehremanan li deverê, her wek rolê "BISMARCK" û qehremanîya wî di şerên bi destve anîna yekbûna Elmanîya[14].
5- Maneva vejenê di perçeyên caran da, yên li pêşîya sinuran û nexerckrna wê vejenê[15].

RÎYALTA KURDÎ YA EVRO DI GEL REWŞA YEKBÛN Û PERÇEBÛNÊ DA, BAŞUR WEK MÎNAK:-

Da bi guman ve bi pirsin, erê em Kurd li herêma Kurdistana ser bi dewleta 'Îraqê ve, yek perçene, yan hijmareka perçeyane?!.
Erê em li kîjan dangehê dane?. Li gur bawerîya min, em li dangehê sêyem da ne, anku perçeyên yekbûyîne/ yekbûna perçeyane. Lê guman û pirs li ser jêderê vê yekbûnê hene, ka aya jêderê wê xweyî û xwezayî ye (yek dîrok, yek cografîya, yek ziman, yek çarenvîs û yek bîrdanga neteweyî û yek ...), yan jî jêderê wê derveyê ye û ji encamê kirdara sinurên dewleta neteweyî ne ku ew perçe di cografîyeka dîyarkirî da civandîne û bi serhevanîne û ne hiştiye ji hev werin perçekrin?.
Di bêjn: yekbûn di hindir şerên yekbûnê li dij perçebûnê da qurbanîyan dixwaze. Erê me ev şere kirne her wek li Ewropa rujava şerên yekbûna dewletên neteweyî kirîn, heya em bi bêjin, em yekin û yekbûnin?! Yan şer û qurbanî ne merce ji yekbûnê ra ? xwe eger merce, ma qey em nikarin şerên xwekujîyê / birakujîyê mîna şerê "Partî û Yekêtî her weha hemu şerên partîyên sîyasî yên Kurdî yên din jî " ji wan şeran bi hejmêrin?!.

---

13 . Ji bu pêtir zanyariyan derbarey karîgerîya sîyaseta dewletên zilhêz di deverê da, vegerê kitêba (Kurdistan fî sîyaset alqwa al'ozma) D. Burhan Ababkr Yasîn.

14 . pirs li vir eve, çima hewlên yekbûna "Elmanîa" û yekbûna "Îtalîa" sergirtin û hemu hewlên " Cemal Ebdulnasir" û "Yemen" wek dû nimûne ji dewleta cîhana sêyem sernegirtin?!.

15 . Mebest pê : her jêyatiyekê hêzek heye û bi wê hêzê taybetmendiyên xwe diparêze û ya amade nîne zo bi zo destberdarî wan taybetmendiyan be û xwe di "kul" ekî da bi buhjîne, tenanet eger jêyatiyeka bala li ser were ferkirin. Ji bu pêtir zelaliyê, perçeyên niha li dewleta "surya" da jiyan dikin jêyatîi ya dewletê û nasnameya "surî" bi serda zale, welê ruha perçebûnê di kiyanê her yek ji wan parçeyan da heye, û her dema ku dewleta surya - wek dewleta 'îraqî bi helweşe - li wî demî ew ruh wê di nava tevaya wan perçeyan da serhilde.

Başe, eger em rêkeftin ku em yekin û yekbûnin, erê di hinavên vê yekbûnê da, perçe hene çaverêyî rewş û kawdanên guncaw ji bu xwe cuda bikin û perçe bibin? erê ta çi rade ew dav û bendên perçeyan bi kaklka yekbûnê ve girêdidin peyt û bi hêzin ku rê li ber perçebûnê bigrin , yan jî ew girê û dav, di xav û sistin û amadene li her demî cuda cuda û perçe bibin.

Lêgerîyan li bersiva van pirsan, dergehê tiyorên nasîwnalîzmê li me ve dike, nemaze tiyora ERNEST RENAN ê Firensî, dema behsa xala (vîna - anku îradeya- jîyana bi hevra) dike u bi yek ji mercên nasîwnalîzmê di hejmêre. Her weha tiyora nasîwnalîzma MATZINI yê Îtalî, dema behsa (yekbûna 'erdî / herêmê / niştmanî) dike u wê jî bi yek ji mercên nasîwnalîzmê dadine. Dîsan me li xalên lawazîya nasîwnalîzma Kurdî radwestîne, ku ez wan xalan li pey pîverê duwalîzma(wekyekî - cudahî) li ser sê astan û bi vî awayî dabeş dikim:-

1) astê yekem: "şebek" bi pileya yekem u "Kurdên êzdî û feylî" bi pileya duwem.

2) astê duwem: Kurdên li "Musil" û dewr u beran jîyan dikin û nebûna hîç pirujeyekê neteweyî jêra, her weha Kurdên li "Kerkuk" û bich neanîna tevaya maddeyên girêdayî pêra(58 - 140 - 23) her ji ruja şikestna rijêma be's û heya niha jî.

3) astê sêyem: hebûna deveran û rêheza "deverçîyatîyê" di naxê hijmareka ne ya kêm ji hawelatîyên Kurd.

Erê ew deverên niha ji deshelata herêma Kurdistanê dabray bi akncî yên xwe yên Kurd ve, çi çarenvîs çaverêyî wan dike? erê "Hewlêr"a paytext ew qeder hêza rakêşanê (megnatîs) heye ku bi kari be wan deveran li jêr çetra (xîveta) xwe ve cemîne?! Yan jî 'eqliyeta deshelata Kurdî ew piruje (plan - sitratîj) vê heye ku pê bikare " vîna jîyana bi hevra" di nax û derûnê xelkê Kurd yê wan deveran da bi çîne û bi wê yekê metrsîya perçebûn û cudabûna wan deveran ji ortê rake?!. Erê sîyaseta Kurdî (Partî û Yekêtî) li devera Musil çi di vî bîyavî da pêşkêş kiriye? çend ji sedê şîyayne jîyatîya wan Kurdan ji bu Kurd û Kurdistanê bi hêz bikin? erê ne dengdayina rêjeka ne kêm ji Kurdên li Musil bu lîsteya Kurdistanî çi metrsî di duv da hene[16]?. Erê kunfiransê "Xanzad" li

16 . Di helbjartnên dawiyê yên civata parêzgehan, li bajarê "Musil" rêjeka berçav ya dengên Kurd bu lîsteka ne ya Kurd û Kurdistanî çun, û helbet eger di paşerujê da raprsînek bê kirin ka aya ew di xwazin bi ser Kurd û Kurdistanê ve bin yan bi ser 'Îraqê ve bin, bê guman ew kesên deng ne daye lîsta Kurdistanê dê 'Îraqê helbjêrn, anku wan kesan vîna jiyana bihevra li gel Kurdistanê nîne.

Sala 2005 ê derbarey " Kurdên Feylî[17]" ta çi rade bi destvehat dilmayina wan ji Kurd û Kurdistanê bi helîne û arasteya wan li "Bexda" ber bi "Hewlêr" vegerîne?. Erê me çi piruje ji bu "şebekan" heye[18]? her weha ji bu "Kurdên Êzdî" ku rêhezên cudabûnê di nava wanda serhldane, nemaze "şebekan" û evcar texeka ne ya kêm ji "Êzdîyan" jî ku hinek ji wan xwe bi 'Ereb di hejmêrn û hinek din jê xwe bi neteweyeka xweser di zanin[19]?!.

Kurdên li ser lêvên sinuran - herêm û Bexda - jîyan dikin, ketîne navbera dû hêzên rakêşanê, dû (newat) an, dû paytextan (Bexda û Hewlêr)w dû jêyatîîyan, em çewa dikarin hêza rakêşanê li Hewlêr mezintir ji ya Bexda lê bikin ? eve karê kêye?.

Erê ma destpêkên metrsîya perçebûnê, li ser astê sêyê (deverçîyatîyê) jî berçav nebûne? (aya hestkirdin be xubin, "Slêmanî" dekat be fîdralî parêzga)[20]? û aya kî sebebe?çend der sed ihtikara binemalan jibu deshelatê sebebe? çewa em rê li ber bigrîn? me çi (serçave) û hêzeka bala heye bibe rêgr? me çi dezgehên dîmukrasî û gerentî yên qanunî hene rê li ber hezên cudabûnê bigrin?. Em çewa dikarin mifay ji dîrokê werbgrin û çewa yekbûna perçeyan bi parêzin, di demek da çavê dewletên dewr u ber û dujmin li ser meye? û destê wana jî di nava me da

---

17 . Kunfransê "Xanzad" li 3/12/2005 li Hewlêr û bi serperştîa seruk "Mes'ud Barzanî" û "Celal Talbanî" hate bestin û dû ruja vekêşa û yek ji tewrên serekî yên vî kunfiransî bi navê (berveçunên - titl'at - Feylî yên paşerujê û helbjartnên dahatî) bu, mebest bi vî kunfiransî vegerandina jêyatîi ya Kurdên Feylî bu Hewlêr ê nek bu Bexda , anku dengdayina wan ji bu lîsta hevpeymana Kurdistanê be û paşî Çiwar salan ser bi wî kunfiransî ve û di helbjartnên dawiyê da kêmtirîn rêje Kurdên Feylî deng ji lîsta hevpeymana Kurdistanî da.

18 . "şebek" serjmêrîa wan nêzî (400000) kesanin û devera ew lê jiyan dikin ku "deşta Musil" e bi bişkek ji xaka Kurdistanê tê hijmartin, di dema rijêma be's "şebek" mecbur kirin ku jêyatîi ya xwe ya neteweyî yan Kurd yan 'Ereb helbjêrin, bişkeka mezin jê neteweya Kurd helbjart û di encamda (22) gundên wana xirabkirin û ber bi deşta Herîr û Çemçemal ve veguhastn û niha girfta jêyatîiyê li cem wana serhldaye, hinek ji wan xwe Kurd di bînin û hinek jê xwe di hijmêrn 'Ereb û hinek din jî xwe bi neteweyeka xweser di zanIn, her çewa be kêmatiyeka jibîrvekiri ye û ez pê na hesm hikumet û sekirdatîya Kurd hîç pirujeyek jêra hebe u li ser demê xwe me pirujeyek pêşkêşî nivîsîngeha berhevkirina xwêndin û vekolînên Partî dîmukrat kir welê çi bersvek jêra nebû.

19 . "Êzdî"diyare siyaseta Kurdî di rasta wana jî da ya kemtrxeme û eger weha berdewam be, renge em jêyatîi ya rêjeyeka mezin ya wana ji bu Kurd û Kurdistanê ji dest bidin.

20 . Navunîşanê nivîsîneka nivîser" 'Eta Qerdaxî" ye, li rujnameya "Hawelatî" jimare (552) li 19 / 8/ 2009 belavebuwe.

heye, em çewa xwe li pilanên wan bi dene paş û me çi pilanên li hember û hevdj hene?!.

ئنطليزى	عەرەبى	هەر ب كوردى	Peyva Têkstê
Bilateral	ثنائية	دووانى /جوَتينى	Duwalîzm
Reality	واقع	ذيَوار /دورهيَل /كەتوار	Rîyalt
Similarities	تماثل /تشابة		Wekyekî
Affiliation	انتماء		jêyatî
Dealing	معاملة	مامةلة	Serederî
Differences	الاختلاف	جياوازى	Cudahî
Acceptance	التقبل	قەبوولكرن	Pejrandin
Other	الاخر	ئەوانەى تر	Yêdin
Challenge	التحدي		Qebxwastin
March	المسيرة		Pêvajo
Independence	الاستقلال	سەربةخوة	Xweser
Awareness	الوعى		Huş
Nature	الطبيعة	سروشت / خوەرست	Xwezayî
Through	خلال / عبر		Hindir
Unbalanced	مختل التوازن		Alseng
Main	الرئيسي	سەرەكى	Bingehîn
Subject	الموضوع	بابەت	Mijar
Match+ing	تطابق		Li Hevhatin
Paragraph	فقرة		Geh
----------	امارة	ميرنشين	Mîrgeh
Reunion	لَم الشمل / تجمع		Serhevhatin
Will	الارادة		Vîn
Perceptions	تصورات		Wênedarî
Concept	مفهوم	ضةمك	Têgeh
Melting/ Decay	انصهار / الانحلال		Buhjîn
Expectations	تطلعات		Berveçun
Dependency	التبعية / الخضوع		Dûvelank
Trend	النزعة / نزعات		Rêhez